



10 sedemên baş yên dengdana KrFê

1. Ji bo malbatan azadiya demê

Malbatên ewle rê li ewlehiya zarokan vedikin. KrF piştgiriya dide malbatên xurttir û ewletir yê ji bo hev dema wan heye. Hemû zarok bêminak in û hemû malbat cuda ne. KrF dixwaze bi piştgiriya aborî ya çêtir, baxçeyên zarokan yê baş û bi zêdetir tiştan azadiya hîlbijartinê û guncawiyê bide malbatan ku jiyana xwe ya rojane organize bikin.

2. Li dibistanan zêdetir mamoste

KrF dibistaneke ku her kesî bibîne dixwaze. Ji bo ku ev pêk bê, pêwîst e ku li polan zêdetir mamoste hebin û li dibistanan zêdetir kesên tecrubeya wan ya pişeyên cuda hene, hebin. Pêwîst e ku dibistan bibin qadên zanistê, lê her wisa pêwîst e ku nirxan fêrî zarokan bikin ku bi jiyane re serederiyê bikin. KrF dê têkoşîna li dijî zorbatîyê dewam bike.

3. Di hemû serdemên jiyane de rûmeta mirovan

Hemû mirov wekhev in, taybetî û şiyane wan vê naguherîne. KrF dê ji bo rûmeta mirovan ya ji nav malzarokê heta mirîna xwezayî di hemû serdeman de tê bikoşe. Divê ti kes ji ber taybetiyên xwe rastî cudakariyê bê. KrF dibêje na ji bo kurtaja yek ji cewîyan û erê ji bo zêdetir alîkarî û piştgiriya ji bo kesên zarokên wan yê xwedî pêdiviyên taybet hene. Em dibêjin erê ji bo venêrîna bêêş ya serdema dawî ya jiyane û na ji otenaziyê re.

4. Li aliyê kesên zêdetir pêdiviya wan heye.

Divê ti kes neyê paşguhkirin. KrF bazara navxweyî ya kedê dixwaze ku her kes dikaribe afirînerî û şiyane xwe bisepîne. Em dixwazin ji bo kesên tiryakê bi kar tînin vebijarkên tedawiyê yê baş, bi taybetî bi rêxistinên xêrxwaziyê re, pêşkêş bikin. KrF dê li dijî bazirganiya mirovan û koletîya modern tê bikoşe û dê li dijî tundî û îstîsmara zarokan bixebite.

5. Civakên herêmî yê zindî

KrF beşdariya hemû herêmên li welêt dixwaze! Em polîtîkayeke çandîniyê dixwazin ku bi xwe re zêdebûna hilberîna xurekan, çêtirbûna pêşveçûna dahatê ji bo cotkaran û parastina xurt ya erd û zeviyan bîne. Pêwîstiya me bi zêdetir pêşketina banda fireh, riyên ewle û alternatîvên veguhestinê yê çêtir yê li ser rêhesin, li ser deryayê û veguhestina din ya cemarîyê heye. KrF alternatîvan dixwaze ku destpêkirina karên nû bê pêşbînkirin û hêsantir be.

6. Merhemet sînoran nas nake

Divê em ne tenê li hundir binêrin, berpirsariya me heye ku em ji bo feqîrên cîhanê piştgiriya alîkariya derveyî, aborî, razemenî û demokrasîyê bikin. Pêwîst e ku em ji bo alîkariya derveyî ya têkildarî perwerdehî, tenduristî û rêveberîya baş, kalîteya bilind pêk bînin.

7. Nirxên berdewam

Em nikarin nirxên xwe teqez bihesibînin! KrF dixwaze nirxên ku Norwec li ser hatiye avakirin, biparêze. Pêwîst e em bizanin ka em ji ku derê hatine da ku gava em rastî mirov û çandên nû hatin em di ewlehiyê de bin. KrF civakeke ku aliyê wê yê bawerî û manewiyatê heye dixwaze. KrF polîtîkayên xwe li ser nêrîna xristîyanîyê ya mirovahiyê, merhemet û rêveberîyê baş ava dike. Ev ew nirx in ku dê dewam bikin.

8. Rûmeta ji bo pîr û kalan

Pîr û kal ji bo civakê çavkaniyên mezin in û pêwîst e ku dikaribin serbixwe bijîn, çalak bin, jiyana wan ewle be û dikaribin heta pêkan de bi tenduristî bijîn. Her dema ku pêdiviya wan bi alîkariyê çêbû, pêwîst e ku ji bo pîr û kalan xizmeta tenduristiyê, hêwirîna guncaw û xizmetên din bîn pêşkêşkin. Pêwîst e ku tu dikaribî jiyaneke xweş û watedar heke derfet hebin bi berpirsariya xwe û tenduristîya xwe bijî.

9. Polîtîkaya kêşûhewayê ya xirab

Pêwîst e ku Norwec berpirsariya xwe bi cî bîne ku guherîna kêşûhewayê kêmbike, hem bi kêmkirina emîsyonên me yê neteweyî û hem jî di qada navneteweyî de bi awayekî çalak piştgiriya vê bike. Pêwîst e ku em qadên bêparastin biparêzin û KrF dibêje na ji bo xebatên sondaja petrolê yê li Lofoten, Vesterålen û Senjayê. Pêwîst e ku em lezê bidin veguherîna ku em çavkaniyên enerjîya xwe nû dike yê nû bi kar bînin.

10. Rawestandina bazirganiya mirovan

Ji koletîya modern re tevgerîyan divê. Mirovên li Norwecê jî rastî zehmetîyan, bazirganiya mirovan û fihûşê tên. KrF dixwaze bi riya yekîneyên polîsên taybet alîkariya mexdûrên bazirganiya mirovan bike û tedbîrên rêgiriya yê wekî zêdekirina zanyariyan û hayjêbûnê bigire.